




Xandinek Li Ser Helbesta Serbest



Fehmî balayî



Helbesta serbest, hind taybetmendîyên xwe hene u bivî şêwey ji helbesta girêday bi hind çarçûveyan tê cuda kirin. herweha dibît helbesta serbest ya rojava ji helbesta serbest ya rojhelat ya cuda bît, yan dihind alîyên, ko girîday serbestî û şêweyê ruxsarî û alîyên honerî cudahîyek li gel ya rojava heye herwekî helbestvanê Ereb (Edunîs) dibêjît;"şureşa min ya helbestê ji egera têkelbûna min li gel helbesta rojava û bitaybetî helbesta Frensî peyda bû"(1) li ser dîyarda cudahîya dinavbera helbesta Erebî û rojhelatî li gel ya rojavayî dibêjît;"piştî min helbesta Erebî û rojhelatî li gel helbesta rojava berawrd kirî, ji bo min derket ko, helbesta rojhelatî ji alîyê mûzîk û peyvan ve gelek ya dewlemende, lê ji alîyê şêwekarî ve ya hejare, lê helbesta rojava ji alîyê şêwekarî ve îya dewlemende. "(2)

Jiber vê jî Edunîs hewldaye helbesta Erebî ji dû alîyanive pêşda bibet;

Yek: peywendîyê li gel şiklî bi şêwekarî ve diket weke helbesta rojava.

Dû: ji kêşeyê derdikevît û peyvê azad diket.

Ev jî tê wê wateyê, ko ji kêşeya (xelîlî) derdikevît û li pîvaneka din digerîyêt. ji vê kêşeyê derdikevît û giringîyê



didet zimanê helbestê, her ji pîvanên şî'rê, tako ber bi pe xşane şî'rê ve diçît. dúbare li hemû curên edebî dinêrît û ve digerîte nivêsa nû, li vêrê Edunîs dibêjît;" helbest li ba min gotineka negotî ye, yan bikêmasî pirsên bersivane d lêge rîyana wendatîyê da. "li vêrê têgehên helbestê tene guhartin, ger kêşe nebît îşareta wateyeka dîyarkirî ye dibîte derbirîneka honerî ji wendabûnê û derbirîn li wateyê dige rîyêt. helbesta nû li ba (Edunîs)î. (3) ber bi şîkl û naveroka çavlêker naçît, şa'ir nikarît têgehek şî'rî ava biket, tako cara yekê têgehên çavlêkerên şî'rî yên hundirîn jinav nebet. jiber wê jî şa'ir nikarît helbesteka nû binivêst, eger hundirê xwe neguhurît û nûjen neket û di serboreka nûda nejît, giringîya vê guhartinê jî pêşdaçûnên di cîhanê da peyda dibin û ber bi cîhana hundirîn ve dibet, da guhartinê di ser da peyda biket û ber bi nûyatîyê biçît. li gorî qûnaxên jîyanê helbest jî dihêt guhartin, (Êdgar Alan Po û Budilêr) li ser helbesta nû dibêjin:"nivêsa helbesta nû ya bi azadî weke honerekî cwanîyê ye, şa'ir navberîyê diket ji bo derbirînê ji hest û dîtînen reha û giştî di hebûna di parçeyanda ji serborên mirovî biket. "têgehestina helbesta nû li ba rojava têgeheştineke bi rizgarbûnê ji girêdanê radibît û bitinê dixwazît di



nêrînên şa'irî da azad bît. li vêrê mirov dikarît bipirsît; aya sinûrên helbesta serbest çine? û cêgirê ko tê pêşkêşkirin çîye? erê helbest xwedî serbestîyeka reha(mutleq)e yan xwedî pîvan û sinûrdare? eve hemû pirsin ji bu helbesta nû ya serbest, tako mirov bigehîte rastîya cudahîyen dinavbera helbesta rojhelat û rojavada. li ser vê jî bilind heyderî dibêjît; "helbesta rojhelat bigiştî pêşdaçûnên xwe ji helbesta kevin werdigerît û xwedî bingehekî firheye j parçey û kêşeya xelîlî li ser avahîyekî nû yê helbestê û derbirîne j naveroka nû, jiber wê jî sinûrên wê di dîyarkirîne, lê helbesta serbest li ba hind rojavayîyan xwedî hind pîvanên taybe teyên bi kultura honerî ve hatîye girêdan. "(4) piştî hind guhartin di meydana honer û edebîyatê da li rojava peyda bûyn, têkelî pitir dinavbera şa'ir û resamanda peyda bû û honerê nûdem ji dayk bû. hunermendên wek: ma nîye tablûyê wî yê binavê (xwarna li ser gîyay). (5) şureşek bû ji bo dabezîna sinûrên ji bo honermend û nivîskaran hatîye danan, lewma kesên mîna (Malarmîye) bi resimên manîye daxbar bû , gelek bi resamên wî demî ve hategirêdan û li ser vê dema Malarmîye dibêjîte Dêga; " şî'r bi peyvan rêkdikevît nek bi fikiran". (6)



Edwer manîye(1832- 1883)

Divî tablûy da: jinek rwîs li gel dû mêran di baxçekî parîsê da runştîye, xo amade dîken ji bo nanxwarnê, herdû mêr bicil û bergin, li paşîya tablûy jinek nû cilên xwe ji ber xwe diket, berî Manîye jî jinên rwîs di tablûyanda hebûn, lê eve cara yekê bû, ko ji şiroveka mîsulujî dûr kevît, berî Manîye jin weke xwedawend, kesatîyên dîroka Ewropa ke vin û sumbul bûn, lê eve jineka nurmale li gel mêrên normal, bi cil û bergên normal yên nûdem, bêy hesteka



mîsulujî têda dîyar biket, lê ev tabloye bû pêngavek, ko jîyana honerî guhartina bixweve bînît û bandora xwe li ser şî'ra nû jî biket(7).

(Pul Valêrî) dibêjît:" ger te bivêt şî'rê li destpêkê bifikirê rêkbêxî, divêt yekem car bi pexşanê dest pê bikey, mirov di pexşanê da dikarît pîlanê resim biket û li dwîv biçît"(8). zimanê pexşanê li ser fikirê radibît û zimanê şî'rê li ser dirustkirina wêne û kêşê radibît. şî'ra remzî jî daxbare bi mûzîkê, ji ber ko mûzîk dikarît honermendî ber bi cîhana hundirîn bibet her wekî (Budilêr) di şî'ra xweya binavê (mûzîk) La musique dibêjît:

Mûzîk min wekî derîayê

Ber bi stêra reng perêw dibet

Li jêr banekî bi mij yan di berizahîyeka firheda

Divî corê şî'rê da, dengên mûzîkê û cîhana şa'irî hevdu di xwînin, ji ber ko mûzîk weke deng û weke rîtm di her cihê da xweşîyê didet mirovî çî ji alîyê rêkxistina peyv, reng, deng û... htd, ew bizavên leş li ser bingehê rîtma pê radibît, ne xwastî rêk dêxît ne ji paldaneka hundirîne stiran bêy gotin

pêdivî bi lerizîneka dengî heye. awaz hevdû digirin, hest di hetkirineka veşartî daye, yek ji nepenîyên vî honerî jî ev ve şartineye, lewma (Malarmê) dibêjît:" veşartin û nezelaî di şî'rê da giringe divêt herdem nepenîya şî'rê hebît, eve armanca edebî ye ne bitenê tişt bête bibîranîn". (9)

Li ser van buçûna helbesta serbest li ser çendîn têgehan dabeş bûye;

- 1- Derbirîn ji serborên şa'irî yên di dil û mejîyê wî da.
- 2- Bikaranîna wêneyê jîndar û peywendîyên wî yên hundurîn.
- 3- Serborên kevin bêne ladan û yên nû li cihê bêne bikaranîn.
- 4- Ritm li ser naverokên nû pêşda biçît.
- 5- Giringîpêdana avahîye helbestê li ser yekgirtina serborê.
- 6- Têgeheştina kelepore ruhî û eqlî yê mirovatîyê.
- 7- Mifa wergirtin ji serborên şî'rî yên nivêskarên cîhanî bide st xistîn.

Divan xalanda, helbest ji bo me çî sinûran dananît, he rwekî çarçûva şî'rê ji babet, ritm, wêne û derbirînê. li ser vêjî (Yusf Alxal) dibêjît;"bingehekî nû ji bo helbestê ji kelepore, mirovatî û serborên şî'rî yên cîhanî peyda dibît û ji serborên



şa'irî û mirovî û wênê giştî ber bi bizava jîyaneka nû dest pê diket. "li vêrê ew şî'rê di têgehê da sinûrdar naket, yan jî giringîyê nadete regezekê bêy regezên dî wek ritm, wêne, ziman yan babet. jiber ko şî'r ne regezên pêkhatîne, berî he rtiştî dîtine. şa'irên nûxwaz bo wê diçin, ko şî'r nexwedî taybetmendîyên honerî ye ger ji dîtîne dest pê neket, ziman, ritm, wêne encamê dîtineka taybetîya tiştane. ev dîtina taybet jî ji encamê dîtînen giştî yên tiştan peyda dibît, peywendîyên ziman, ritm û wêney nînin, ger di berceste kirina van peywendîyan da nebît, li vêrê dû corên dîtîne he ne; dîtina bi hestên çavî û dîtina bi hestên dilî. dîtina yekem ji bo tiştê ji derve u nelve u diyek wêney da nahête guhartin, dîtina duwem; nexucihe û dîmenên xo diguhurît, lê cewherê wê binecihe. dîtina yekem hestî ye u derveye ya duwem dilî ye û hundirîne, ya yekem xwecihe u ya duwem di guhartinê daye tiştî ligorî dîtina hundirîn dibînît û carek dî aşkera diket û ji nûve nûjen diket. ev wêne jî ji dîyarda aşke ra ber bi ya veşartî û ji parçeyê ber bi giştî diçît. mirov dikarît bêjît helbesta serbest nêrîneka nûye j cîhanê, cudaye ji wê nîrîna çavlêker, şoreşeke li ser têgehên kevin û hewldane ji bo afrandina cîhaneka nû ya pitir serbestî xwe



têda dibînît. şî'r wênên pirsane ji bo bersivan. dîtina di şî'rê da berî dîyardên zanistî û felsefî peyda bûye, zanîna jêderê heye ew jî dîtine, ew dîtina yekem zarvekirin di şî'rê da kirî, paşan ber bi zanst û felsefê çûye. ew tê wê wateyê ko şî'r jêderê zanîna zanist û felsefê ye, jibo rastîya vê jî hizir di he lbestê da tê veguhastin bu wêne u remzî, bo şîklê honerî, karê honerî jî rê ya xwe nagirît bêy hizir yan helwêstek di duzeka jîyanê da bêy felsefeka taybet girêday şa'irî bît, ji be r vêjî rastîya fikirê şîkl û cwanîya xwe didet karê honerî. he lbesta nûdem jî ldestpêkê tiştê nû ber bi xweve dikêşît, lê tiştê nû jî jîyê wî kurte, di nûxwazîyê da, tako peyvê jî wateya xwe heye. (10)

Şî'rgerî Ya Wêneyê Honerî

wênê zêhnî yê dîtîna li gel wênê rewşnbîrîya xwedî afrandin derdikevît. ew wêne bi dîtîna kûr li ser tiştan û nêrîna germ û jîndar ji bo karekî şî'rî yê baş bikar tîna, ger wênê şî'rî di avahîye giştî da giringîyê bi regezên hestkirinê bidet dê madê xam jê dirust ket. divê reoşê da hest xwedî rolekî giringe d gehştina teyaretên xwedî bandor ji ronahîya wênê şî'rî da. li vêrê dîyar dibît ka kîj hestê pêtir şîyanên



pêkhata wênê şî'rî heye? di lêkolîn û zanista derûnî ya nûda derketî ye ko li gorî serjimêrîyê 85% dibêjin wênê zêhnî yê dîtîne bihêztire û 69% dibêjin wênê zêhnî yê guhgirtîne paşan hestên destkirîne (allems) û zewq û xemgînî bihêztire . li vêre em di gehîne wê encamê, ko dîtîne hesteka di wênê zêhnî yê wêney da pêtir bibizave. piranîya wênên li ba şa'iran derdikevin giringîyê diden dema dîtîne û piranîya şa'iran giringîyê diden hişîyarbûna hestên dîtîne li ba xwandevanî, xeyala di wênê zêhnî da bikar tê, giringtirîn re gezê xoşyê ye j bo bikaranîna wêney li ba şa'irî. ji ber ko wênê zêhnî alîkareke ji bu şa'irî, ji bu lêgerîna ji lêdanên re ngên dîtîne û wênê nivistî hişîyar diket di bê suzîyê da de rbikevît û ber bi rûberên deqê şî'rê biçît, jiber ko di bê suzîyê da xizîneka ne aşkirakirî heye ji ber wê jî hizirkirina navxoyî ya şî'rê bi cudahîya rêbaz û alîyan ve jî pêngava ye keme ji bo aşkirakirina vê xizîne û bi berhemdar diket, bi vî şêwey wêne dema li gel ezmunên şa'irê rastgo hawpeyman bît dê pêtir xwedî afrandin bît. herwekî (Bursuf) dibêjît;" amajeyên hestkirîne di wêney da pleya sozên şa'irî sinûrdar diket. " herwekî hatîye aşkirakirin, ko hestên şa'irî gelek di derbirîn û sozên şa'irî da tîne bikaranîn û pêtir berfrheye d



avakirina honerî da. gelek caran şa'irê nûxwaz di wêneyên şî'rî da rûdan û serhatîyên dîrukî û kevin bi wênekê nû û xeyaleka nûve girêdidet, yan hind serhatîyên zarokî û bîre werîyên li ser wênekê nû di afrînît(12). ev yeke jî peyda nabît, ger di demekî da hizirkirina hundirîn ya helbestvanî nebît ya helbestvan li gel dijît û nexoşî û derdên xwe li gel parve diket. ev reoşa wênê zêhnî bê dengî û binecihîye peyda naket, her tim di livînê dayew pêwîstî bi demê heye u diheman demê da ji dayk dibît. wênê zêhnî pêwîstî bi are zwîeka bi bandor û xwedî berhem heye di nexoşîyanda dijît dema tişteki dafrînît, hizirkirina zêhnî heritm xudî dîdilyeka hundirîne, jiber wêjî li ser helbestvanî pêwîste d aramîyê da bît, da wêne d reoşe ke sruştî da jidayk bibît, jiber ko ne aramî û hêrs dê bîte egera ji daykbûna wênekî şelexî yan mirî, diser vêra wênê zêhnî pêwîstî bi balaxwedanê heye de ma wêne di asanîya xweda baş bît, wate ev peydabûna şîyanên zêhnî di hêza berdewam û binecihîye daye. em di helbestên gelek helbestvanên nûdem da dibînîn, ko wênê dîtinê vemirî ye û mirî ye herwekî (Sî, Dî, Lwîs) dibêjît;" he lbestvanê îro pêşwazîyê lê naket, alîkarîya xeyalê li ser wî pêwîste ji sifrê dest pê biket. " wênê zêhnî yê dîtinê



giringîyê didet vejînkirina xeyalê û wêney bi rengên paqij û balkêş reng diket, herwekî vê yekê gelek helbestvan giring dibînin û bi alîkarîya vê yekê helbestvan dikarît, li gel pêkhatên navxoyî yên wêney destnîşan biket. vî wênê dîtîne di herdemekî da dîtîneka nû ji tiştan heye û li çavkanîyên ronahîye digerît. serkeftina wênê zêhnî yê dîtîne vdest xistî, ji egera tumarkirina sruştî di cihê bandora şî'rî da ji ber giringî pêdana jêderên dîtîne yên gelek û ze ngîn ji ber ko kumkirina şa'irî ji wênên dîtîne gelek pêtire ji kumkirina hestên din, jiber vê jî wênê dîtîne helbestvan pêtir di ji daykbûna helbestê da dibînît. ev hestkirinên dîtîne hebûna têgeheştina babetî ye ji ber ko wan ezmûnên xoş li gel wêney pêşkêşî bînerî diket, lêdanên cwanîyê pêtir bandorên xwe li ser hestên bînerî diken. jiber vê jî endamê zêhnî yê dîtîne her tim di bizavê daye u pêşwazîya wêneyên nû diket. dîyarda helatinê li ba helbestvanî ji lîdanên wênê zêhnî yê dîtîne dîyar dibît û helbestvan hest bi geheştina helbestek nû diket û ji dayk dibît. hind caran jî yekaneyên dîtîne cilên remzî li xwe diken ji egera têgeheştina babetî di navbera helbestvanî û bingehê wênê zêhnî da, ev nayê wê wateyê, ko hestên din rola xwe di avakirina wêney da



nabînin, regezên bi bandor gelek n û di jêk cudane li gurî e
zmûnên helbestvanî û sruştê bandora di wê demê da û ç
nd mifa wênê helibestê jê wergirtîye, lê li dawîyê em
dixwazîn bêjîn, ko wênê zêhnî yê dîtinê di avakirina wêney
da ji hemûyan pêtir bandorê li ser helbestvanî diket. dihe
lbesta şa'irê navdarê Ferensî (Budilêr) di helbesta bi navê
(çwarçêwe) da dibêjît:

**weko çwarçêweyekî cwan lewêne bigirî,
Sereray ewey beflçeyekî degmen kêşra bê,
Nazanim çendê namo û dilxoşkere
Kele sruştî mezin cuda bikirêtewe,
Herweha xişil û kel û pelî nawmal, mîtal û zerkeft,
Xwî legel ew cwanîye degmene deguncand;
Hîc şitêk ew runakîye rehayê na hebesênê,
Hemû şitê bewe deçû bwî bête çwarçêwe.
Tenanet hendê carîş wa dezanra ke hestî tîaye
Hemû xistê deyewê xoşî biwê;
Rutîye şehwet amêzekey nuqim dekirde
Nêw maç û mûçî etles, eteg û memiklex,
Le ser xo ya bepîrr taw, lehemû çûleyekyewe
Mîhrebanî mindalaney entîkeş beriz debuwewe. (13)**



Budilêr weke divê helbestê da dîyar kirî, ko bi xeyaleka kwîr û dûr xwe berdaye dinava sruştê mezin da û li wêne yên cwan digerît. herwekî resamek zêrevanîya cwanîya sruştî diket û li jêr ronahîya xwezayî ya tîrojken rojê bejin û bala evîndara xwe rengîn biket û weke tablûyekî şewekarî çarçûve biket û dinava çar dîwarên malê da û her tim û herdem li berçavên şa'irî bimînît, Bodilêr di xeyala xweda li jêr ronahîyeka destkird jî etmusfêrek rumansî wênekirîye, herwekî resamê Ferensî (Edgar Dêga), çawan livîn û rengê se makerên balê dinava çar dîwaran da wêne diket û tablûyekî cwan ji dayk dibît, wesan Bodilêrê şa'ir jî xwastîye b peyvan û bi xeyala xwe wênê evîndara bi livîn û semakirin û rûtî û hemerengîyê wêne biket. bi vî şewey mirov dikarît bêjît; wêneyê şa'irî pêdivî şarezayî û ezmûneka roşnbîrî û honerîye da ji darêtina vî wêney peyva tevlihev neket, çawan resamek rengan tevlihev neket, da bişêt tablûyekî cwan ji wênên honerî pêk bînît(14). dema em behsê wêney honerî diherkarekî afrandinê da dikeyn, gereke mirov bigehîte wê bawerîyê, ko hind wêne hebû ne berî dîyarda wênê honerî. ev wêne jî demekî dirêj girêday qonaxên jîyana mirovî bû. herwekî demlîdestîya cwanîyê dikarê mirovî da berî honerî de



rketî, dema em li edebîyat û honerî dinêrîn herdû bi alavên afrandineka rasteqîne rewşen dibin. nek di rê ya demlde stîyê da, belko di rwşnbîrîya berî dîrukê da, dinêrînên cwanîyê da, zanistî, yan jî hizira rast ya gotinê, nikarît xe batên xirafata qebûl biket. di cudahîya mirovên kevin yên xirafî û nemeeqûl û nezanistî da, diheman demê da honer singê xo vediket ji bo efsane u xirafatên sade li ser gerdunê, mînakê vê yekê jî diher reng û wêneyekî da wateyeka taybet heye. rengê sor jibo stêrekê yan kewkebekê di hizira mirovê kevin da xwîne, şer û nexoşî yedinava civakê da, he rweha helbestvanên rojhelatî soratîya lêvên evîndara xwe b cwanîyê li qelem diden. ev hemû wêneyên biçûkin, ko peywendîya dinavbera xwezayî û civakê da pêktînin. herwe ha hevrikîya dinavbera civak û xwezayê da bo hemû dîruka kevin ya mirovatîyê vedigerît. lê kar û berhem dinavbera herdû alîyanda navberin. li vêrê mirov dikarît wênê honerî li ser hizir, made û kirîyarê: dîyarda wêney bi wesfê ruxsar, binîyat û hestkirinê dabeş biket.

Dîyarda Wênê Madî Di Wênê Şi'rî Da, Bi Wateya Ji Kirîyarê Bo Peyvê.



Ev hewlên, jibo xandina helbestekê yan rengên helbestê di tablûyda tîn kirin , vê peywendîya hawbeş weke dîyarde ka roşnbîrî binav diken, tiştê hawbeşê herdû alîyan bihevra girêdidet wêneye. çî wênê helbestê yê honerî bît, çî jî wênê rengên tablûy bin. cwanîya her karekî honerî bandora xwe li ser hestên bînerî diket, dibîte rêyek, ko helbest û tablo bihevra hevdîtînê pêk bînin, xoşî û hestkirina bicwanîya helbesteka lêkday ji wêne û peyvên cwan di boşayîya rengên jîndardaye. ev renga jî dibošayeka xeyalîda di helbestê da tîn bikaranîn û xandevanî dibete cîhaneka dûr û bişewq. dema mirov li rojhelata navîn li vê dîyardê binêrît, dê jibo me aşkera bît, ko piranîya rêbazû dîmenên şêwekarî ji he mbêza şêwekarîya Ewropî ya nû ji dayk bûne, bitaybet li de stpêka sedsala bîstan. Ew jî pêtir di dû xandîngê honerî da xweya dibît, xandîngêha şeşpalo (tekeîbî), lijêr bandora Pîkaswî û Birak, xandîngêha din (tecrîd) lijêr bandora Kandinskî û Mîrwî, ev jî weke hevjiyana dinavbera mutîf û tecrîdî da, lê dîsan li ser gelek şêwan dihête binaf kirin he rwekî di dawîya sedsala nuzdanda (Murîs Dîbîs dibêjît:" wêne d bîngêhê xwe da rûbereke ji renga hatîye dapoşîn, li ser bîngêhekî dîyarkirî rêkxistî ye"(14). lapereke ji bo



rizgarbûn ji hêrşên nûdemîyê li ser tecrîdê. ev dîyarda nivêşîna parçekî helbestê yan her berhemekî din, bireng û wêne bê afrandin ne dîyardeka nûye, dnivêsnên herêmî yên kevinda, bitaybetî di cîhana îslamîda, ev jî dîyare di karên honermendekî weke (Wasgî) datê xweyakirin, yan karên (Behzadî), yan jî dikarên (Şerefyanê Betlîsî) da, nivêşiyên (muqamat Alhrîrî) xweya diken, herweha di ragehandina îroda bitaybet şêwê reş û sipî yan kovar û ropelên rengîn bi tabloyên nûdem xemlandîne, bi şêwên cuda wêne û peyv bihevra girêdane. ev jî dwê bawerêdane ko ne alîyek bandora xweli ser yê din biket, lê jibo balkêşîya bînerî û xwe ndevanî dema tablûyekî honerî li gel nivêsekê bihevra dibînin û hest bi xoşîyê diken. herwekî di mînakên mînatoran da dîyare:

Jêder û perawêz

- 1- دكتور فاتح علاق: مفهوم الشعر عند رواد الشعر العربي الحر، دراسة منشورات اتحاد الكتاب العرب، دمشق: ٢٠٠٥.
- 2- دكتور فاتح علاق: مفهوم الشعر عند رواد الشعر العربي الحر، نفس المصدر
- 3- ئەدونیس: نافئ وی علی أحمد سعید أسبر: ل سالا ١٩٣٠ ل لازقیئ، سوریی ژ دایک بوویه، نافئ ئەدونیس ژ داستانەکا فینیقی وەرگری یه و هکه شاعرەکی نافدارئ

سهدهسالا ببيستان تى ناسكرن، يهكه ژ وان شاعرين شيعرا عهههه ب جيهانئ
دايهناسكرن.

٤- . دكتور فاتح علاق: ههمان ژيدهر

5- Vanessa PottsÖ Monet, Einführung von Dr. Claire O´ Mahony,
Köln,2004,S. 24¹

٦- آلان باوس: الفن الاوربي الحديث، ترجمة: فخري خليل، مراجعة: جبرا إبراهيم
جبرا، دار المأمون، بغداد، ١٩٩٠، ص٢٩

7- Maler: Leben, Werk und ihre Zeit. Heft. 12. Klarke- Johanson,
Hamburg. 2000. S. 366

٨- دكتور خليل الموسى: هجرة النصوص و جماليات القراءة والتلقي، مجلة الموقف
الادبي- عن اتحاد الكتاب العرب بدمشق، العدد ٤١٧، كانون الثاني ٢٠٠٦
٩- ههمان ژيدهر.

١٠- الأدب الاسباني المعاصر: ترجمة؛ د. طلعت شاهين، منشورات المجمع الثقافي.
أبوظبي، ٢٠٠٣ ، ص ١٩٦

١١- نبيلة الرزاز اللجمي: أصول قديمة في شعر جديد، وزارة الثقافة دمشق، ١٩٩٥، ص٥٥
١٢- بودليير: گولى خراپه، شيعرى فرهنسى به كوردى، وهركير: نهحمهه مهلا، دهزگای
چاپ و بلاوكرارهى ياراس، ههولير، ٢٠٠١ ل٥٣

١٣- نبيلة الرزاز اللجمي: أصول قديمة في شعر جديد، وزارة الثقافة دمشق، ١٩٩٥، ص٦٤
١٤- صبري عبالغني: الفراغ في الفنون التشكيلية، الحداثة وما بعد الحداثة، المجلس
الاعلي للثقافة، القاهرة، ٢٠٠٧، ص٦٤